Kurdistan
Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin
PDK-S Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriyê 1957
Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (259) | Çileya Pêşîn / 15-12-2023

# Bilindkirina nirxê dermanan rewşa xelkê zehmetir kiriye




Kurdistan

Ev çend car in di vê salê de, rejîma Sûriyê nirxê dermanan bilind dike, zêdebûna vê carê jî di navbera 70 heta 100 %.
Bilindbûna dermanan bûye cihê dilgiraniya welatiyên Kurdistana Sûriyê, û ew dixwazin sînorek ji van kiryaran re were danîn.
Dermansazek ji bajarê Qamişlo ji Rojnameya Kurdistan re wiha dibêje, zêdebûna vê carê bi daketina berdewam ya nirxê lîreya Sûrî li beramberî dolarê Emerîkî ve girêdayî ye. Ev buhabûna niha rewşa xelkê zehmetir kiriye.
Nexweş gazinan dikin, û dibêjin jiyana wan bi van dermanan ve girêdayî ye, lewma ew nikarin hemû dermanên xwe bikirin û neçar in li ser hesaba tenduristiya xwe dermanan kêm bikar bînin. Welatiyek wiha dibêje"mûçeyê min tenê 300 hezar lîreyên Sûrî ye û ew ligel hevjîna xwe nexweş in, nikarin dermanan wek pêwîst ji xwe re bikirin, û pêwîstiya vê rewşê bi çareseriyekê heye.

## Qamişlo.. Ji ber nebûna mazotê tenê 5 demjimêran elikitrîka muwelîdeyan tê dan

Kurdistan

Xwedanên muwelîdeyan li bajarê Qamişlo xelkê bajar agahdar kirine ku dê demjimêrên dana kehrebê kêm bibin û ji 8 demjimêran dibe 5 demjimêr. Nirxê her Empêreke kehrebeya muwelîdeyan bi 13 hezarên Sûrî ye.
Xwedanê Muwelîdeyekê ku ne xwestiye navê xwe eşkere bike wiha dibêje, kêmkirina demjimêrên kehrebeyê li hin taxên bajarê Qamişlo ji ber biryara rêveberiya PYD ye, ya rawestandina belavkirina mazotê bi ser xwedanên muwelîdeyan, û wan serdana wêstgehên sotemeniyê kirine û ew agahdar kirine ku ti mazot li cem wan nîne û nikarin ji wan re dabîn bikin.
Herwiha got "Nirxê litra mazotê ya taybet bi muwelîdeyan 125 Lîreyên Sûrî ye, û 30 hezar nirxê veguhestina vê mazotê ye heta cihê mebest, û ji ber vê yekê ew neçar bûne demjimêrên kehrebeyê kêm bikin".Lirta mazotê ji derve bi 4600 Lîreyên Sûrî ye piştî biryara dawî ya rêveberiya PYD bi bilindkirina nirxê mazotê. Ji destpêka vê salê ve li bajar û bajarokên Kurdistana Sûriyê krîzeke mezin ya sotemeniyê heye, û vê yekê bandoreke gelekî zêde li xelkê kiriye bi taybet malbatên hejar. Di dema dawî de jî xwepêşandan ji bo demekê li dijî bilindkirina nirxê mazotê li hejmareke bajar û bajarokên Kurdî birêve çûn, têde welatiyan daxwaza daxistina nirxê mazotê li rêveberiya heyî kirin.




Welatiyek ji Rojnameya Kurdistan re wiha dibêje, rast e mazot ji bo malan tê dan, lê gelekî kêm e û têra xelkê nake, lewma pêwîste ev rêje ji xelkê re were zêdekirin.
Niha xwedanên muwelîdeyan jî demjimêrên kêm yên kehrebê didin û bi demjimêran ew di tariyê de ne, ma gelo ev dadperwerî ye,ma gelo ev jiyan e jiyana ku têde dijîn.

Ekrem Elmela.. Xwediyê pênûsa azad nayê jibîrkirin *Rûpel—2*
Kesên sert û serhişk *Rûpel—3*
Dînê axa Cindirêsê *Rûpel—4*

### Ekrem Elmela.. Xwediyê pênûsa azad nayê jibîrkirin

# 4'emîn salvegera koçbarkirina medyakar û siyasetmedarê Kurd Ekrem Elmela

Hêvî Delî-Qamişlo

Medyakar û siyasetmedarê Kurd "Ekrem Elmela" xwediyê pênûsa zêrîn di çend û wêjaya netewî û civakî û siyasî de, û di tevgera Kurdî de li Kurdistana Sûriyê xebat xwe dikir, û di nivîsandin û gotarên xwe de hertim ser êş û azarê miletê Kurd tanî ziman, û bi dilsozî û rêzdarî roleke berçav û bi bîrûbaweriyeke bihêz di xizmeta doza mafê Kurdan dikir, û taybetmendiyeke xwe di warê rojnamevaniyê de û di belavkirina hişmendî û nemayên aştî û resteqîniyê di nivîsandina gotarên xwe de hebû, û ji ber geşbûn û xurtbûna pênûsa wî ya azad û zêrîn di gelek rojname û malperên Kurdî de kar dikir û dinivîsand, taybet di ragihandina navendî ya Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-Sê, û rojnameya Kurdistan de, jibilî vê yekê jî serpirştî di gelek xulên ragihandinê de dikir û bi dehan ciwanan ber destê wî fêrî karê ragihandinê bûne.

Derbarê 4'emîn salvegera koçbarkirina medyakar "Ekrem Elmela" ronahiyek li ser kar û xebata wî di warê siyasî de:

Jibilî karê rojnamevaniyê medyakar "Elmela" di warê siyasetê de jî xwedan karîzmayeke taybet bû û kesayetekî azadîxwaz û niştîmanberwer bû, hezkiriyê dibistan netewyî û rêbaza Barzanî û Kurdayetiyê bû.

> Ekrem Elmela di dilê her endamekî de ye

"Mela" di ciwaniya xwe de sala 1970'an de tevlî nava refên Partiya Demokrata Kurdistan- Sûriya û tevgera siyasî Kurdî bû, bi moralekî geş û bi hêz di têkoşîn û xebata xwe de berdewam bû, ta kongirê "Dehan" êdî xebatkar Ekram Mela hate hilbijartin wek Endamê Komîta Navendî, û piştre di Kongireya sala 2014'an ya li Hewlêrê, û ji bo geşbûna û xurtbûna hestên wî yê netewî û rola wî di pêşengiya tevgera Kurdî de hat hilbijartin ji bo endamtiya Desteya şêwermeniyê ya PDK-Sê, êdî ew jiyana xwe di hizir û ramanên Kurdayetî yê de derbas dikir.

Her di vê derbarê de jî hêjaya ronahiyek ser Kurtejiyana siyasetmedar "Ekrem Mela", di warê Jiyana wî de.

Xebatkar û nivîskarê Kurd Ekram Elmela, jidayîkbûna sala 1956'an de, li gundê Til Eylûl yê ku dikeve gundewarên bajarê Dirbêsiyê de, xwendina xwe ya seretayî û navendî li dibistanên bajarê Dirbêsiyê bidawî kir û xwe di zanîngeha Helebê kolêja wêjayî beşê zimanê Ingilîzî tomar kiribû, lê xwendina xwe berdewam nakir, piştre ji hezkirina wî ji ragihandinê re wî berê xwe da welatê Yekîtiya Soviyêtê û li zanîngeha Mosko de Master di başê medyayê de bidest xist, û piştre vegerya welatê xwe û li Dirbêsiyê û dest bi karê rojnemevanî û siyasetê kir, herwiha "Mela" ne tenê di warê siyasî de têkoşîna xwe dikir, lê ew weku nivîskar, rewşenbîr, medyakar di nav milet de dihat naskirin.



> Ekrem Elmela xebatkarekî nayê jibîrkirin

Di roja 17'ê Berçilya sala 2019an, di roja Alaya Kurdistanê ya pîroz de, medyakarê Kurd Ekrem Elmela berê xwe dabû Şamê paytexta Sûriyê ji bo çareseriyeke pizîşkî wergire, lê li wir rastî kirîzeke dil hat û di encamê de canê xwe jidest da, û çû ber dilovaniya xwedê, êdî navê "Ekrem Elmala" bi roja Alaya Kurdistanê ya pîroz ve hate girêdan, û şopeke zelal li pey xwe hişt ku partî û hevalên wî yek ji stûnên herî giring û bi nav û deng li Kurdistana Sûriyê ji dest dan û bi merasîmeke geş ji aliyê milet û keseyetên siyasî û rewşenbîrî û hezkirî û kesûkarên wî ve, li gundê wî Til Elûl li bajarê Dirbêsiyê bi xakê hat spartin. Ew pênûsa azad û gotinên nivîsandinên wî nayên jibîrkirin, wê her di dilê hezkiriyên medyakarê kurd Ekrem Mela û di rûpelên dîrokê de zindî bimîne .

# Ala Kurdistanê bi xwîna şehîdan parastî maye

Kurdistan

Parlamentoya Kurdistanê di sala 2009an de biryar da, ku êdî her sal roja 17ê Kanûnê wek "Roja Ala Kurdistanê" were pîrozkirin. Ji wê demê ve heta niha ne tenê li Başûrê Kurdistanê, lê belê li tevahiya Kurdistana mezin û li cîhanê ev roj ji aliyê Kurdan ve tê pîrozkirin.

Li Başûrê Kurdistanê di roja Ala Kurdistanê de, hemû bajar û bajarok bi ala rengîn tên xemilandin û li hemû bajaran çalakiyên cor bi cor tên lidarxistin, herwiha li perçeyên din yên Kurdistanê jî tê pîrozkirin.




Ala Kurdistanê, bo yekemîn car 74 sal berî niha di 17ê Kanûna 1945 de li ser banê Komara Kurdistanê û ji aliyê yekemîn Serokomarê Kurdistanê Qazî Mihemed ve li paytexta komarê bajarê Mihabadê hat bilindkirin.

Lê Ala Kurdistanê di heyama salên 1927-30 de jî ji aliyê Rêberê Serhildana Agirî, Ihsan Nûrî Paşa ve jî hatibû bilindkirin.

Temenê Komara Kurdistanê ya bi paytextiya Mihabadê kurt bû, lê parastina Ala Kurdistanê wek nirxekî netewî û hildana wê hertim li cem Kurdan û serkirdeyên tevgera rizgarîxwaza Kurdistanê wek tiştekî pîroz ma.

Serok Mesûd Barzanî jî derbarê Ala Kurdistanê de dibêje: "Ez ji bo serxwebûna Kurdistanê û di yekemîn Komara Kurdistanê de li Mihabadê û di bin siya Ala Kurdistanê de ji dayik bûm û dixwazim di bin siya Ala Kurdistaneke serbixwe de bimrim."

Berê jî li hemû sazî û dezgehên hikûmeta Herêma Kurdistanê Ala Kurdistanê dihate bilindkirin. Lê Serokatiya Herêma Kurdistanê, di sala 2006ê de bi fermana jimare 60, bi awayeke fermî biryara bilindkirina Ala Kurdistanê li hemû sazî û dezgehên hikûmî derxist. Ala Kurdistanê ji jor ber bi jêr ve, ser hev ji sê zemînan pêk tê. Di navendê de jî roj heye. Li jor rengê xwe sor e, navîn spî û jêr jî kesk e. Roja nav alê bi 21 tîrejên wek hev hatiye xemilandin.

Rengê sor şoreş, xwîn, hêz û yeksaniyê temsîl dike. Rengê zer, ronahî, tirêjên rojê û hişyarî, rengê spî, aştî û aramiyê, rengê kesk jî welat, parastin û ciwaniyê nîşan dide.

# Daxwazên dijî normalkirina pêwendiyên ligel rejîma Esed




Kurdistan-Bidûvçûn

Sînatorê Emerîkî French Hill daxwaz ji Parlematerên cîhanê kir normalkirina pêwendiyên ligel Beşar Esed red bikin, û kar ji bo danîna planekê ji bo pêkanîna çareseriya siyasî, û dubare avakirinê piştî proseya siyasî li Sûriyê bikin. Sînatorê Emerîkî û serokê grûpa taybet bi Sûriyê di Kongirêsa Emrîkî de French Hill di gotarekê de ji rojnameya The Hill re behsa serdana xwe ji bo Sûriyê dike, daxwaza dîtina çareseriyeke siyasî li Sûriyê dike, hevdem daxwaz dike çêkirina madeyên hişbir were rawestandin. Herwiha French Hill daxwaz ji Civaka Navdewletî kir, hewlên Komkara Erebî ji bo vegera rejîma Esed di nava bingehên navdewletî û dîplomasî de red bike. Got jî, qebûlkirina Komkara Erebî ji rejîma Esed re desthilata Îranê û çêkirina Keptagonê kêm nake, berûvajî hinceta welatên Erebî ye bi nêzîkbûna wan ji rejîma Beşar Esed re, tekez kir normalkirina pêwendiyan ligel vê rejîmê aştiyê berqerar nake, û bi milyonana penaberan venagerîne.

> **French Hill: Divê pêwendî ligel rejîma Esed neyên normalkirin**

---



Azad Haco Hemê

# Kesên sert û serhişk

Tiltemir

Civata me Kurda jî mîna her civatên duniyayê ye ku her cûrên mirovan têde hene an peyda dibin, ji aliyê hiş û raman û danûstandinê de û serderiyê ve, têde hene yên rû nerim û rû reş, têde hene yên sert û serhişk û yên zirtokî ( esebî ) ezê divê gotara xwe de, behsa wan cûrên sert û serhişk bikim, jiber zerar û bandora wan li hawîr dora wan û civakê heye, îca ew jî bi du şêweyane, şêweyek ji wan çaxê ji dayik dibin wiha têne duniyayê bi wan re ev diyarde hatiye afrandin, û hin ji wan ew xwe wiha dikin wate bi Kurdiya me ya gelerî xwe dîno mîno dikin jibo hin mebestan em ji van re dibêjin ( kawik şeytanî ) çima ez behsa van kesan dikim jiber evana bêhin teng in zû deng bi serê wan ve naçe, zanin rastî di ku deye lê xwe dikin ku ew nizanin, evana dibin sedemên tev hevî û ji hev xistina civakê û car caran dibin boblatek mezin li ser wê, jiber tê bi şopîne ku rojekê ew cîranên xwe pev diçinin bi hev re şer dikin, rojekê xwe bi xwene, ew kurên xwe, ew keçên xwe, ew hevjînên xwe, bira û birayên xwe û xuhên xwe, yan ew her kesî û h..d, jiber evana ji rûyê xwe avîtîne, rûmetê ji ti kesî re nagirin kes li wan mûn nake xeberokî ne ziman lêçin çi tê ser zimanê wan dibêjin maf sizin, torebûnê ji her kesî re di afrînin, ezê meselakê wek mînak ji were bîninm ziman, ti diber çav re derbas bike ku em wek desteyak civakî êlî ya lihev hatinê ne, em çûn nav malekê xweş bikin wan li hev bînin ku xeyideke di nav bera wan de rû daye, em şok û matmayî man ku bav ji law û qîza xwe xeyidî ye, û di hundirê yek malê de jihev cihê bûne, tevî ku hîn lawên wî bê hevjînin, bûne du beş her beşek xwarin û alav û razana wan cihê ye, wate tişkî pirr ecêbe dema em çûn wan lihev bînin, me dît ku yê pirr dijwar û asê dike bav e, tevî ku em li tenişt wî rawestiyan çimkî bav e heya ku şaş be jî yan ne mafdar be dibe ku merev vê xalê liber çav bigre, me berevanî diber de kir û bercewendiyên wî dane pêş tevî vê û çûna sê şevan liser hev li ba bav me tenê karîbû bav û qîza wî lihev bînin, lê mixabin ew û lawên xwe lihev nehatin tevî ku lawên wî rû nerim bûn û ti astengî an şert û merc nedan ber me tevî hemî hewlan em paşil bûn an em bi serneketin ku wan li hev bînin em pir xemgîn bûn liser vê rewşa ku ew mal têde dijî mala ku her roj bi şer û pevçûnan derbas dibe, ew cîranên xwe ne lihevin ew zarwê birayê xwe ne lihevin, di dewsa ku bav bi vê rola me raba û ne hiştiba bighê vê asta pir aloz, îca tevî vê jî boblata herî mezin ku bavekî serhişk û sert û zirtokî ye ew li dû vê rewşa xerab û kampax e, ka wê zarokên xwe li ser çi perwer dê rake, wê sibe roja wan zarokan çibe, zarokên ku bavê wan, wan bi xwendin nade ye wê liser çi bingehê rabin û mezin bibin, demek ne dûre ku zarokên wî jî li ser vê hişmendiyê rabin û mezin bibin û ew jî tiştê bavê wan bi serê wan de tîne ew jî bînin serê zarokên xwe, û ev ya em naxwazin bibe jiber ev diyardana dibin sedemên herî mezin ên jihev dûrxistin û jihev ketina civakê, îca heya ji me û ji dest me bê, dibê em li pêş van kêşeyan rawestin, û em nehêlin pir an mezin bibe û çara jêre bibînin da civaka me aram be û saxlem û hevgirtî bimîne û ev civat bikeve xizmeta doza me ya Kurdî de.

# Dînê axa Cindirêsê (kurteçîrok)



Nehro Goranî

Nîvê şevê ye, sibê tukê here dibistanê, ê de raze keça min, ji ber ku sibê tu mîna şêra şiyar be, dibên zû xewke zû şiyar be tu wek şêr û agir be.
Yadê nizanim çima xewa min nayê?
Êdî xewke delala min.
Dayîk, bi destekî di ser porê ŞANA re bi tiliyê xwe porê Şana yê guftîlk şeh dikir, û destê xwe yî din tiliyê Şana mistdidan,
Dibera diloran, de nenî nenî delala min nenî, Hindek hindek çavê xwe dan hev û kete xewê aram.
Şevek dirêj bû, dawî nehat, ji nişkava Diya Şana got: ev çiya ya xweda çi bû bilez şana kir hembêza xwe
Ev çi denga, Bavê şana rabe zemîn hilweşî, xanî bû landik.
Zû rabin.
Tariyê perda xwe bi ser bajarê Cindirêsê de berda, tevî pênc salan tar î kêlîkekê ji esîmanê bajêr neçû ye.
Kevir li ser kêvir nema, avahî tev hilweşîn, hewar û qêrîn guhê esîman diçirand, darên zêtûnê pel çelimisîn, keziyên keça hinc bûn çemê hêsira diherikî.
Gundên derdora bajêr hatin bi dest û tiliyên xwe kevir û ax radikirin, terimên dost û hemisiyan ji nav kavila radikirin, birîndarên xwe radikirin.
Ev Ciwane: de ka em bi nerim derxin, nalîna Ciwan erdê dihejîne ne bi ser birîna xwe tenê de, bi ser wenda bûna heval û dosta de. Êdî ka em birîna wî dermankin: ka çawnî û zêtin zêtûna hûnin ta em wî radikin nexweşxanê, destpêkê ka em va xwînê pak bikin û birînê bi zêtê û çêw lê balînin em mekin girêdin.
Dibin avahiya de dengê nalîn û fîxana hîna tê, dilê me nagire em herin mal, hêvî ya em nabirin divê em hewaldanên xwe bikin.
Dost û kesên biqêret şev û roj ranawestin
Xew nayê çavê wan
Li nav kolan û li avahiya digerin deng ji ku tê li wir kar dikin Belikî birîndarekî rêzgarkin, dengê tevir û bêra ji hev nayê birîn, lê kêlîk kêlîk dengê nalîna wenda dibe.
Ji Rojhilatê bajêr de dengê kerwanekî nêzîk dibe, gelo ev çi tê ? Çi dibe?
Kîne ev?
Tîrêj di roja sisiyê de xwe berdidin ser bajarokê birîndar. Dibin kerwanek tê Alek li sere tîrêj rengdide.
Ê dî baş e ger kî were me ji va tengiyê derxe, destên wan xweş bin, ger mirov ket tengiya hêviya ji çûkên esîmên dike, xwedê tu kesî di tengiya de nehêle, dibên: ger mirov ket avê destê xwe davêje stiriya.
Kerwan ket nav bajêr xelikê tevî êş û birînên xwe ew bi lîliya pêşwazkirin, û hêvî ji nû ve çêbûn.
Kerwan li kolana û avahiya belav bûn her beşekî bi karê xwe rabûn.
Comerd birê Dîno:tu dibîhise, dengê zarokekî tê, dê hele ... Belê raste de ka bi aramî em hewal bidin van kevira rakin, dengî nêzîk dibe, vaye porê xwe xuya bû, keçikike delal e, dê were delalê, keçik derxistin.
Navê te çiye?
Ji min re bêje tu der te nêşin.
Dîno keçik hembêz kir
Navê xwe bêje: navê min Şana ye, tu delal î
Şana: dayîk û bavê min li kune?
Dîno: bav û diya te ê werin, Şana tu dest û piyên xwe bilivîne, ê başe tu duristî, navê te çiye.
Navê min Dîno ye
Miletê va bajarî bi min re dibên Dîno.
Belê ez dîn im
Bi dînîtî ji va bajarî hezdikim.
Ji va avê...ji çiya û miletê xwe Ji va kevirê Şana parast, sê roja ji Şana re bû mîna sîwana.
Ez dînê va rojê me,
Roja ku li nik miletê xwe bim va miletê dilsoz birînên wan dermankim, êşên wan parvekim.
Dînê va porê herîşimî yê bi bihina şîlanê Hewarê dihatin şiştin.
Şana, Dîno: ez jî bawer bûm hûnê werin, min û hevalên xwe berxwe dida, li hêviya dengê wa bû Li hêviya pişkuvandina van tîrêja.

# Bo çi Barzaniyan

Anahîta Hemo

Çima gundê Barzan
Dabû dilê wî hovî
Xwînmijê Kurdan
Çima Barzaniyan?
Ne mîna hemû Kurdan
Hatin veşartin
Ho.. Enfalno, bê gunehno,
Perîşanên biyabanan
Penaberiyê, dilsozên Kurdayetiyê,
Ji çiyayên Barzan ta biyaban
Bûn qurbanên azadiya Kurdistan,
Ax û sed Ax çendî hêstir bûne lehî
Li ser termên ji hestiyan,
Tabûtên mejû, mirovayetî
Bawer nake Bawer nake
Xweda.. Ma ne namûsa mirovin
Heşt hezar Barzaniyan
Bê hişim, îro roja pêşwazîkirinê
Rondik na rawestin, ne jî diçikin,
Ber dîmenên nemirî ji dîroka durdan,
Pîroztirîn ji wan termên enfalkirî nebûrîne
Di dîroka faşistên cîhan,
Ma geko hêrandin û dêranina
Hestiyên wê rêjîmê çiye himberî
Kul û derdên nemirî
Çi dayik û jinên bi hêstirin
Pîst û sê salan çav jî bûn kanî,
Pîroze Barzan, ew gundê şoreşê,
Pîroz in cil û bergên Pêşmergeyan,
Pê hatin nasîn, ew tawan
Faşistên kîmawî bi wê cemedanê
Kurd dane nasîn,êdî kes maye
Kurdan nas nake, bi wê lez û beza
Barzanê nemir li ser wan kaş û
Newalan diherike îro giyanê
Nemirê Kurd, bûye mînakek
Mîna giyanê xezalan hildikşe çiya
Li dûv xwe dihêle xêr û bêra jînê
Da dûv nemiriyê, xak jî pîrozkir,



Dîroka Kurdan,barzaniyên nemir,
Bi xwîn we kirî xaka meyî pîroz
Ta vejîn kirin keyser û rêber,
Ta bûn serokê Kurdistana payedar,
Bi we bawerim, we Kurd parastin,
Bi we bawerim, dîroka Kurdan
Qirkirina we bû navnîşana me
Mirina civakî bûye teybete bi gelê me,
Mirina tebayî çendî pîroz e, Jenosîd,
Bi asîd û xerdel, em bûn miletek cîhanî,
Cîhan, bi dîl û perîşaniya me hişyar bûn,
Tirb û gorên Barzaniyên nemirin
Didin nav nîşana milyonên windakirî
Nayên bawerkirin, ji bilî girî
Zê çikim diyarî, dilsoza we me,
Dilsoza we me, Kurdên derûnpak
Bi rûmet, dijî mirinê,
Mê bijîn hevalno,
Di nemiriyeke kûr de,
Bo zar û nifşên nû, ew omîd in,
Bo pêşerojê, Dilsoza we me,
Îro şiyarê doza xwene
Li hêviya dadgeha
Diktator,
Îro roja pêşwaziya
vepexirandina
Gorên bê sociyên pakrewanên
Enfalan, Li we xwedîne,
We dane pêçan
Bi pîroztirîn Ala rengîn
We bo me Hilda
Û dîsa zar û zêçên we
bi wê bi xwe pêça
Vaye periya we enfalan,dîsa
Vejîne, ji derya tê der,
Piştî xewa dîliyê
Periyek nûjen,bi xemla dîrokê,
Barzan dinale dike hewar
Dide qîr diktator
Çûn kanî zarên min
Bo em bijîn çend
Ê rojên pêşeroj
Mixabin ; deng li wa vedgere,
Bi giyanê firiştî gihane xweda,
Bîranîn jî man pêçayî bi ala
Birîn,kul,keser ferhenga
Xemgîniyê êdî nikare,
di singa xwe de
Wan bicivîne,
Xwe spartin
xweda,wek heviya asîmanî,
û dîsa didin cîhan
bihuşta Rojhilat,
Ew e Kurdistan vaye vegerye
bûye mînakek ji
Dana xweda çendî
dem bûrîn,
Lê neyên jibîrkirin di hizir û bîran,
Çîrok û dîroka Kurdên perîşan,
Sûnda min bi we, bi wan dîliyan,
Kurdên bi rûmet,
bi ola pakrewan,
Maye bê tîn
Tîn jî naşikê, di bihuşta cîhan
Hatine belavkirin ew Barzaniyan
Penaberên xemlû xêza jiyanê,
Bê par in, bê par in,bê par in
Çima Barzniyan?
Pîrozin bi ola kale xwere dijîn
Nemirin, bijî bijî dîroka Kurdan

# Sed dinank



Dr. Munîb Ehmed

Bi Kurdî:Sed dinank. Bi Latinî:Tubulus terrestris.
Bi Erebî: قرطب ارضي .
Rûssî:Якорцы стелющиеся. Bi Ingilizî:Ground burdock. Sed dinank Giyakî yeksalane ye ,şaxê wê tenike ta 60cm dirêj dibê ,Pellên wê beramberî hevin kulilkê Seddinankê zerî biçûkin ,Tovê Seddinankê Stêrikî 5-goşeyî ye ,serê Anişkê wê gelek ziravî tûjin weke derziye ne. Di Meha Nisanê de êdî Kulilk digrê. Li Rojhilatî ûrupa û Qefqazê û Rojhilata Navin peîda dibê li Deşt û li kevikê Riya û li Çivakê Çema şîn tê . Pêkhatiya Kimawî :Glikozidê Stiroîdî(Trilin, Gratsilin, Diotsin, Diospanin,....). Flavonoîd,Alkaloîd û Vitamin C pêkhateyên Giyayê Seddinankê ne . Bi egera zenginiya giyayê Seddinankê bi Teresseyên giring ew ji Glikozidê Stiroîdî kû bi Trûbuspanin tê bi nav kirin Fişarê xwînê dadixê . Berî Sedê Sala Seddinank di hat bikaranin wekû Dermanekî giring ji bo nexweşiye Dirûnî (Nefsî) û her weha ji bo ji nav birina Kevira di Gûrçika û Zirav de û ji bo Qolincê Mizrew û Roviya de ,her weha Dermanekî çalak kere ji bo laş. Beşê li ser zemîn wekû Giyaderman tê bikaranin li ber sikê tê ziwakirin di dema kû kulilkê wê geşîn,wekû ça ye tê vexwarin.

